



KURMANJI

Bernameya otêl û tûrîzmê

**Bernameya otêl û tûrîzmê
bernameyeka pişeyî ye û
bidestxistina dîplomeya
pişeyî armanca wê ye.**

Bernameya otêl û tûrîzmê ji te re yê ku hez dike di warê tûrîzm û xebata otêl û konferansan de kar bike.

Tu dikarî piştî qedandina xwendinê yekser kar bikî yan xwendina xwe li xwendîngeha bilind ya pişeyî berdeham bikî. Tu dikarî jî ji xwe re kursên zêde bixwîni da xwendina xwe li xwendîngeha bilind bidomîni.

DU PISPORIYÊN CUDA

Otêl û konferans

- Tu dê zanyariyan li ser beşên cuda yên otêlan û karê di konferansan de werbigiri. Tu dê fêrî xizmet, pêşwazî û ka mirov çawa civîn û çalakiyan organîze dike, plan dike û pêk tîne bibi. Ev pisporî îmkanê dide ku tu, bo nimûne, li pêşwaziyê, di warê cîveqetandin, konferans yan xizmetkariya mêvanxaneyan de kar bikî.

Tûrîzm û ger

- Tu dê zanyariyan li ser înfomasyonên ji bo tûrîstan, rêxistin û plankirina geran, çalakî û mijûliyên balkêş û cih û rêyên geran werbigiri û herweha fêrî xizmet û pêşwaziyê bibi. Ev pisporî îmkanê dide ku tu, bo nimûne, di warê çalakî û mijûliyên balkêş, înfomasyonên ji bo tûrîstan, rêberî yan cîveqetandin û firotinê de kar bikî.

Tiştên ku tu dê di vê bernamê de fêr bibi

Tu dê zanyariyan li ser xizmet û pêşwaziyê, têkilîkarî, rewackirin, firotin, şîrketkarî, ziman û cih û rêyên geran werbigiri. Herweha, tu dê zanyariyan li ser plankirin, rêxistin û aboriyê û li ser pêwîstî, adet û hevîyên mirovan di heqê xizmetkariyê de û li ser pêşketina xurt di warê tûrîzmê de werbigiri.

Bona mirov xwe ji ziyarên karî biparêze û tenduristiyeka baş pêk bîne, giringiyeka mezin di vê bernamê de li ser pirsên jîngeha karî ye.

Bername weha hatiye rêxistin

Madeyên dersê di bernamê pişeyî de madeyên lîseyê yên hevbeş in: îngilîzî, dîrok, werziş û tenduristî, matematîk, zanist, zanyariyên dîni, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê.

Di bernamê pişeyî de, tu dê zêdetir madeyên pişeyî, yên ku jê re madeyên taybetmend tê gotin, û kêmtir madeyên ku te li dibistana bîngehî xwendine bixwîni.

Îngilîzî, mitehîdî, otêl, konferans û çalakî, xizmet û pêşwazî û tûrîzm madeyên taybetmend yê hevbeş yê vê bernameyê ne.

Îmkan heye ku tu di bernameyê de xwe pisportir û zanatir bikî. Ji wê re bernamekûrkolîn (programfördjupning). Ji xwendingehê bipirse ka ew kîjan kursên kûrlêkolînê dide.

Hilbijartina ferdî jî heye ku tu dikarî wê ya ku tu dixwazî bixwînî hilbijêrî. Ji xwendingehê bipirse ka kîjan kurs hene.

Awayên xebatê

Tu dê di vê bernameyê de şiyana xwe ya hevdîtina mirovan û pêşxistina têkiliyeka pîşeyî bi mêvan û mişteriyên re xurt bikî. Tu dê xwe fêr bikî ku tu li agahdariyan bigerî, wan analîz bikî û binirxînî û bi hişmendî tev bigerî.

Tu dê tiştê ku tu fêr dibî minaqeşe bikî û lê bifikirî û xwe ji bo hînbûna berdewam ya di jiyana karî de amade bikî.

Projeya lîseyê

Tu dê di dawîya Bernameya otêl û tûrîzmê de projeyeka lîseyê di warê pîşeyî yê ku te bijartîye de amade bikî. Tu dê bi wê nîşan bidî ku zanyariyên pêdvî yê ji bo destpêkirina karê ku te ji bo xatirê wî xwendîye li bal te hene.

Fêrbûna li cihê karî

Hin beşên xwendinê herî kêr 15 hefteyan li cihê yan çend cihên karî bi rê ve diçin û jê re arbetsplatsförlagd lärande (apl) – fêrbûna li cihê karî – tê gotin. Ev parçeyeka giring ya perwerdeyê ye. Apl tecrîbeyan û herweha kontaktan yê ku dikarin di dema lêgerîna karî de ji te re bisûd bin dide te.

Şagirdîkirin

Heger xwendingeh di çarçoveya bernameyê de perwerdeya şagirdîkirinê ya lîseyî pêşkêş bike, tu dikarî wê hilbijêrî. Maneya wê ew e ku tu dê heman zanyariyan werbigirî lê dê herî kêr nîva xwendina xwe li cihê yan çend cihên karî bikî.

Balkişandin

Giring e ku tu xwendina xwe plan bikî heger tu bixwazî şertên xwendina bilind bi dest bixî. Ji bo bidestxistina şertên bingehî yê xwendina bilind tu dikarî li gor dilê xwe di çarçoveya hilbijartina ferdî û bernamekûrkolînê de, heger xwendingeh wê pêşkêş bike, kursên pêdvî bixwînî. Ew du kursên zêdetir yê zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê ne. Heger tu bixwazî hêjî bixwînî, li gel rêberê xwendin û pîşeyê biaxive.

Hergav mafê te heye ku tu di çarçoveya hilbijartina ferdî de kurseka din ya zêde di warê werziş û tenduristiyê de û kurseka hunerê hilbijêrî.